

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar (109)* *Sal 20 Avrêl 2015z - 2627k* *Buha (50)L.S*


## Yekbûn û Serhişkî!


▪ Desteya sernivîser


**K**er û kûr jî zanin, ku rewş li Rojhilata Navîn bi tevahî û li Sûriyê û Îraqê bi taybetî, li ber guhertinên mezin in. Ji wan guhertinan, belkî ya tewir mezin be jî, di pirsa gelê Kurd de çê dibe. Gelê Kurd, bi saya qurbandayînên giran ku ji du sed sal de dide, îro derdikeve ser rûyê dîrokê.

Ker, kûr, biçûkên di zikên diya xwe de û miriyên di goran de jî zanin, ku li demeke wiha dîrokî, zor pêwîst e, ku li her beşekî Kurdistanê yekîtiyeke siyasî bi lez û bi hêz çê bibe.

Lê belê…!! Berê digotin Kurd serhişk in, û me jî zanî ku em wilo ne, lê me ew sincî di xizmeta xebat û di parastina heyîna xwe de didît û bikar tanî. Lê mixabin! Xuya ye Kurd tenê ji hev re serhişk in û ``gurên canê hev in``. Roja îro gerek e em tenê li ser doz û mafê gelê xwe (serhişk) bin, ne ji bo wê êdiyolciyê, vê rêbaz, vî partî, wê zarav, vî serokî, û hwd. Dem ne dema wan e. Îro roja milet e, roja welêt e, roja nivîsandina dîrokek nû ye, eger destê hemî nofên gelê me tê de tunebe, ewê beravêtî bibe û neçe serî. Bila em çav, guh, hiş û dilê xwe ta dawiyê ji hev re vekin, û serhişkî û êdiylocî û seroktî û berjewendên partîtiyê jî ta dawiyê berdin. Dem ne dema ku em li ser wan li hev nekine. Berjewendiya gelê me di kû de ye, bila em li ser wê pêdar û (serhişk) bin, bila ji bo wê ``yeka me kêm be``, ji bo wê ji hev re dînin û çavên hevdû jî maç kin.

Ma çê dibe, ku Kurdên Sûryê bi dû nûneran di Cinêv (III) de beşdar bin? !. Kî ji wan kane bêje ku ez nûnerê Kurda me?!. Ev perçebûna li berjewendiya kê ye?. Kî sûdê jê werdigire?. Gelê me?!. Bêguman na?!

Roja îro berjewendiya gelê me di yekbûnê de ye, di jinûveçalakirina ``Lêvegera Siyasî`` de ye, ew ji me re zor pêwîst û giring e. Loma jî kî asteng û keleman dixe pêşiya çalakirina wê, dîrok wê wan rûreş bike û gelê Kurd jî wê hesabên giran ji wan bixwaze.*

## Em dikarin roja welatê xwe bi şahîyên zarokan rengîn bikin



**D**i 3-4-2015 û di bin durişma (Em dikarin roja welatê xwe bi şahîyên zarokan rengîn bikin), çalakîyek li bajarê Efrînê bi …….❻

## Pirs û bersiv


▪ Memê Alan


**J**i roja roj de, gelê me yê Kurd ji aliyê zeftkarên Kurdistanê ve rastî setemkarî, bindestî, komkujî, enfal, binpêkirina mafan, pêlanên kirêt û hewildanên tunebûn û ji-holêrakirinê hatiye.Lê, ew bi jin, mêr, ….❷

## Xelata Kemal Henan




**B**i boneya cejna rojnamevaniya Kurdî û derbasbûna 117 salan di ser derçûna …….❺

**Pirs û bersiv … Dûmahîk**

biçûk û mezinên xwe ve tucarî li hember wan ton kiryarên nemirovane serî netewandiye û dest û pê ji ber xwe berneda ye; wî hertim li ber xwe daye û bi dehan serhildan û şoreş li hember zordar û dijminên jiyanê rakirine, lê hercar jî bi şêwekî perçekirî, qetqetî, herêmkî û bê yekrêzî maye. Wê lomê jî carekê ji caran hewildanên Kurdan bi serneketine û encamên baş û berhemdar jê nehatine wergirtin .

Niha jî Rojhilata Navîn bi tevayî û Kurdistan bi taybetî li ser volkan û hejînekê dijî û li ber guherînên nû ye, guherînên cûrbercûr û ji her alîkî ve derfeteke zêrîn – weke çavdêr dibêjin –li pêş Kurd û Kurdistanê ye, ji ber vê yekê jî gelek pirsên bê bersivên tewaw di serê mirovê Kurd de digerin bi hewcî bersivên rast in, û bi hewcî ye jî ku hinek bi wêrekî destê xwe dînin ser birînê û zengilê metirsiya heye lêdin. Da ku, ji alîkî ve gelê me hişyar bibe, rastiya xwe nasbike û bi rola xwe rabe, û ji alîkî din ve jî tevgera me ya siyasî li her çar aliyên Kurdistanê li xwe vegerin û nekevin çewtiyên bav û kalan û dafik û pêlanên xapînokên xêrnexaz, ewên bi xwîna Kurdan nebîranî ne.

Di vê çarçewê de, emê pirs û bersiveke ramyarî gerek hişmendiya mirovan û mijarên li pêş me wînin zimên .

Ji ber ku mirov tiştê herî buha di jiyanê de û dema mirovê civakekê azad û bi rûmetdûrî zordarî û mirûditiyê – bijî, ewê bikaribe bi hişmendî û bi rastî bi rola xwe di avakirina civakeke azad de rabe, wê lomê divê em hewil bidin çawa mirovê Kurd ava bikin. Di baweriya me de, divê em hişyarî û hişmendiyê di nav xelkê xwe de belav bikin, paqijiyê di derûna wan de biçînin, hewil bidin rastiyê ji wan re bibêjin, deriyên hişweriyê vekin û mij û dûmanê ji pêş çavên xelkê xwe bidin alî, da ku asta hişweriya mirovê Kurd bighê asta nasîna rasteqînî û jiyankirina ramana azad û demoqrasî û wan ji ramanên îdolocîk dûrxînin. Ji ber ku îdolocî bi hemî rengên xwe ji berhemên mejiyê hin mirovan e û ji bo rizgarkirina mirovan çêbûn, lê di heman demê de jî ew sînorkirin û zîndankirina ramana mirovan e û zordarî bi xwe ye jî, û dema mirov mirûdê îdolociyekê be û bixwaz ji çarçewa wê derkeve bi êşekeke derûnî hestiyar dibe, du kesayetî dibe, bi xwe re dikeve nakokiyan û rewşa wendabûnê. Gelek pirsên bi bersivên nerast û kêmbawer, herweha baweriya xwe bi xwe wenda dike û ji koletiyê re amade dibe. Mirovê baweriya xwe bi xwe nemîne jî, wê xwe dûvçilk ji kesekî din re bibîne.

Li vir pirs ev e, çima mirovin wê xwe ji hinên din re mirûd dibînin û amede bin jiyana xwe jî ji ber wan de bidin?. Ji ber ku ew kes baweriyên wan bi rengekî ji renganjê hatine qopirandin, bûne dîlê baweriyê xeynî xwe û hebûna wan bi xwediyên wan baweriyan ve hatiyê girêdan. Di dîroka kevin û nû de gelek xwedî îdolocîkên navdar û bi bandor derketin holê-belkî hin ji wan xwedî armancên baş bûn jî-, lê di baweriya me de îdolocî çi be û xwediyê armancên çiqas qenc be jî, ev pêgirêdana ewqas metirsîdar e jî. Ji ber ku, ta demekê ew bi roleke erênî radibe û di demeke din de jî, metirsiya wê li derdora xwe pirtir dibe û zirarê dighîne mirov û civakê.

Ji ber vê, em wek mirovê Kurd çiqas ji ramana îdolocîk a teng û metirsîdar dûrkevin û ji ya azad û demoqrat ve nêzîk bibin û ji xwe re bikin çande di jiyanê xwe de, ewqas emê civakeke azad û lihevkirî ava bikin .

# " Ewrupistan " Nabe Kurdistan

**Merwan Berekat**

Piştî şoreşa gelê Sûrî ji şêweya xwe ya aştiyane derket, û berve çekdariyê hate têvedan, û ji aliyê hin dewletên hermê ve destêwerdan hate kirin, armancên şoreşê serûbin bûn û têkçûn. Ji ber ku wê destêwerdanê rikberî ji hev qetand û belawela kir, û hêdî hêdî şoreş ji pir aliyan ve hate dizîn.

Ji aliyekî din ve, van sedeman hîşt ku rûberê şer, pevçûn û çekdariyê firehtir bibe, û herweha kuştin, binçavkirin û wêrankirin derbasî bajar, bajarok û gundên Sûriyê bibe.Vê yekê hîşt ku bi milyonan xelkê Sûriyê li derve û hindurê sînorên welêt bibin penaber, rewşa wan jî li ber çavan e, ku çiqas çîrokên curbecur ji êş û derdan bi ser wan de tên.

Bêguman; rewş û qeyrana ku Sûriyê tê de dijî, bandora xwe ya neyînî li hemû warên jiyanê kir, hema hema mirov dikare bêje, ku di piraniya nexşeya Sûriyê de, nema jiyan dibe, û berdewamiya wê di pir herêman de mirin bi xwe ye.

Di destpêka şoreşê de, û ta roja îro jî, piraniya herêmên kurdî, nemaze Efrîn û Qamîlo hêmin û aram in, û tu pirsgirêkên ku jiyanê rawestînin, ewqas nînin, Lê mixabin, tevlî wê jî, nexweşiyeke zor xirab û bi tirs di civaka kurdî de peyda bûye. Eger çare jê re netê dîtin, ew pir bi metirsîn e, û bandoreke wê ya neyînî li çivak, dîmografî û siberoja Rojavayê Kurdistanê heye, ew jî, koçberî ye.

Di van du-sê salên dawî de, bi hezaran ji malbatên Kurd mal, zevî û her tiştekî xwe firotin, û bi riyên curbecur xwe li sînoran dan, û berê xwe dane welatên Yekîtiya Ewrupa. Ji wan e, ku ew diçin bihuştê. Di wan riyan de gelek çîrokên tirajîdî bi serê piraniya wan hatin, hin ji wan bûn qurbaniyên pêlan û laşê wan li kenarên deryan hatin dîtin, hin ji aliyê rêberên riyên ne rewa ve hatin dizîn, û li ser sînoran rût hatin berdan, û hin ji wan gihîştin armanca xwe. Mixabin ta dema nivîsandina vê gotarê jî, karwanê vê koçberiyê ranewestiye.

***Pirsa mezin ew e, ma gelo sedemên vê nexweşiyê çi ne?***

1- Berî şoreşê pirtirî milyonek Kurd li bajarên mezin wek Heleb, Şam… HWD bi cî û war bûbûn, hin ji wan karmendên dewletê, hin karkir û hin jî xwedî pirojeyên taybet bûn, û piraniya wan di rewşeke aborî ya baş de dijiyan. Piştî ku nema jiyan di wan bajaran de tê berdewamkirin, ewan li herêmên xwe vegerîn, lê ew rastî gelek dijwariyan hatin, û nemaze di aliyê cîwarbûn û aborî de.

2- Di herêmên Kurdî de, ji hin astên xwendinê, û nemaze ya zankoyî re, derî li pêş piraniya xwendekaran hate girtin, û ta astên seretayî, amadeyî û navendî jî, ne ewqas serast in, ji ber wê jî, pir malbatan ji bo xwendina zarokên xwe riya koçberiyê dan ber xwe.

3- Ta astekê, lihevnekirina Tevgera Siyasî ya Kurdî jî, bû yek ji sedemên ku hin ji Kurdan berê xwe bidin derveyî sînorên welêt.

Rast e; di dîroka gelan de, û bi taybet di rewşên ceng û nearamiyê de hertim koçberî çêbûye, lê dema ku ew digîne asta metirsînê, hin çareserî jê re tên danîn, û bi şêwakî ji şêweyan pêşbirî lê tê kirin.

Zor pêwîst e, ku Kurd û di pêşî de Tevgera Siyasî ya Kurdî, saziyên civakî û ta rewşenbîrên Kurd ji vê nexweşiya bi metirsîn re hişyar bin, û hewil bidin ku hinekî golvedana wê kim bikin. Eger ev koçberiya tewşankî netê dorpêçkirin, dê guhartinên bi tirs di dîmografiya Rojavayê Kurdistanê de çêbike. Bi dehên salan rêjîma Elbe`s bi pilan û pîlanên xwe yên şûfen û nijadperest hewil dida, ku herêmên Kurdî ji Kurdan vala bike, lê bi xebat, ronakbîrî û haydariya Tevgera Siyasî ya Kurdî û rewşenbîrên Kurd, ew pîlan û pilanan hatin pûçkirin. Mixabin îro Kurd bi xwe wan pilanan li ser xwe cîbecî dikin.

Belkî; rêjak biçûk ji Kurdan di koçberiya xwe de mafdar bin, lê piraniya wan bê sedem xwe tûşî vê nexweşiyê kirine. Ewan mal, dar, erd û hemû tiştên xwe yan difroşin, an jî, li şûn xwe dihêlin û bi perene pir ku dikarin pê bi salan li welêt bijîn, berê xwe didin biyaniyê, ji wan e, ku diçin bihuşta jiyanê. Ne tenê wisa, piştî ku ewan digînin wan welatan, wêneya gund, an tax, an jî bajarê xwe davêjin ser rûpela xwe ya fêsbokê û hevokên ( Min bîra te kiriye. Ez ji te hez dikim) li ber wê datînin. Ma gelo mirov çawa dikare li gund, tax û bajarên xwe derewan bike? Hin jî, ji wan wêneya xwe davêjin ser wê rûpelê û li bin dinivîsin ( Pîroz be, em gihan armanca xwe ), lê bila bizanibin ku ewan windabûna xwe û ya zarokên xwe pîroz dikin. Û mixabiniya mezin ew e, ku rêjak ji wan di tevgera Kurdî de xwe netewperest, welathez, niştimanperwer û xebatkar didîtin, lê dema kar û xebata rastînkî û piratîk dest pê kir, wan riya revê dûz kirin, û pişta xwe dane welêt. Ez ji wan dipirsim: ***Ma gelo, Ewrupistan dibe KURDISTAN?***

## Roja Rojnamegeriya Kurdî Rojeke cejn û pîroz e !

Bi armanca geşkirina zanîn û bilindkirina asta rewşenbîriyê di civaka Kurdî de, yekemîn car di dîroka gelê Kurd a nûjen de, li roja 22ê Nîsana sala 1898an, ronakbîrê Kurd ê payebilind, Mîr Miqdad Midhet Bedirxan rojnameyeke du heftane bi zimanê Kurdî, bi navê "**Kurdistan**" û tîpên erebî li paytexta Misrê (El-Qahîre) çap û belav kiriye, û ew roj li nik Kurdan bûye roja şahiyê, bûye cejna rojnamevaniya Kurdî.

Lê, wekî her kesê dîrok û jiyana vê rojnameyê xwendiye, dizane ku di bin bandora şêwirmendên xwe yên şoven de, yên mîna Ebu Elhuda, sultan Ebdulhemîd bi tundî şerê derçûna rojnameya Kurdistanê kiriye û biryara qedexekirina wê li ser xaka dewleta Osmanî daye. Rojnameya Kurdistan neçar dimîne, ji Misrê bar dike û li Ewropayê cîwar dibe, li wan welatan jiyana xwe berdewam dike, û tîrêjên zanînê davêje Kurdistanê. Careke din, Sultan hewil dide ku vî dengî nebihîse, şerê derçûna wê li Ewropayê jî dike, lê ew di hewldanên xwe de têk diçe. Bi cefakêşî û vîneke xurt, çar salan rojnameya Kurdistan li ber xwe dide, 31 hejmaran diweşîne û li roja 14.04.1902an, hejmara dawî ji vê rojnameya nirxdar çap dibe, û ew bêdeng dibe !

Di rewşeke ewqas têkilhev, dijwar û aloz de ku gelê me yê Kurd û tevgera wî tê de dijî, û ji ber ku rojane ew tûşî êrişên tund ên derûnî, leşkerî û pilanên ji hevxistina civaka Kurdî ji hêla xêrnexwaz û hêzên terorîst ve, ên deverên me dorpêç kirine dibin, erk û ustûbarê hemû nivîskar, medyakar û alavên ragihandina Kurdî ew e, ku li hemberî van pilanan bêdeng nemînin, û bi hemû hêzên xwe aramiya civak û herêmên xwe biparêzin. Di vî warî de, ji bo belavkirina çand û gotara hevrêzî û hezkirinê di civaka Kurdî de xebateke îjdil pêwist e. Neyarên hebûna me, ji bo çavên me kor bikin û em pilanên wan nebînin, wekî her car, ew dixwazin kîn û nakokiyan di navbera Kurdan de gur û geş bikin, da ku em di nav toz û dûmana vî şerî de pêkoliyê bikin û her xwelîser û bindest bimînin!. Di bin çi perde û navnîşanê de dibe bila bibe, ew çand û gotara nakokiyên xwexwetî geş dike û dide pêş, ew berjewendiyên xêrnexwazên gelê me destek dike û civaka me ber bi taromariyê ve dibe, giringe li hemberî wê em rû bi rû derkevin.

Li dawiyê, bi helkefta vê bîranîna giranbuha, em cejna hemû nivîskar, medyakar û xebatkaran pîroz dikin, hêvî û omîda me ew e, ku her ew şiyar û zîrek bin, beşdariyê di weşandina çanda nûjen a mirovahiyê de bikin, û her ji bo xebatên aştî, azadî û wekheviyê, amade û li kar bin!.

- **Rêz û silav ji nemir Miqdad Bedirxan û şehîdê rojnamevanî û peyva azad Mûsa Enter re.**
- **Azadî ji hemî rojnamevanên girtî re .**

*15.04.2015Z-2627K ...*

**Komîta Çand û Ragihandê ya**

**Partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

## Çalakî



**Efrîn**.. Di 24-4-2015 û bi boneya roja rojnameya kurdî , rêxistinên partîya Yekîtî li herêma Efrînê şahîyek li dar xist . Bi sedan ji endamên partiyê û piştgirên wê li |Çiyayê Qaziqli şahî lidar xistin, û cihê şahîyê bi alên Kurdistanê û diruşma partiya Yekîtî hat xemlandin.

pişt re, hin gotin hatin kirin. Gotinek bi navê raghandina partîyê ji hêla Dr.Mihemed Ebdo de hat xwendin, tê de kurtegotineke li ser rewşa Sûriyê, çapemeniyê û rewşa wê û rojnamevanên Sûrî, û rola wan di qeyrana Sûriyê de anî zimên û wiha got:

((Çar sal di ser şerê navxweyî re li Sûryê derbas bûne. Vî şerî hemî pêkhateyên civaka Sûryê dane ber agirê xwe, ... Di nava ev şerê giran û qirêj de, roleke alavên ragihandinê ye zor giring û dîrokî xuya dibe. Bi saya medyekar û rojnamevanan, bûyer û kiryarên kujeran têne nasîn, tomarkirin û li ser raya cîhanî tên belavkirin. Loma jî… astengên mezin û rojane li pêş ragihandinê tên danîn, karê wê qedexe dibe, û medyekar û rojnamevan dikevin bin hovîtiya giran, tên kuştin, girtin û windakirin jî)). …………5

## Çalakî … Dûmahîk

Wî berdewam kir û got: ((Li gora serhejmarên pêbawer, di nava van çar salên şerê Sûryê de, dora 225 medyekar li Sûryê hatine kuştin, û bi sedan jî birîndar, girtî û yên ku hatine wendakirin. Di nav pakrewanên pênûs û ragihandinê de, hevalê me yê hêja sernivîserê Rojnama me``Newroz`` Kemal Henan jî hebû, ew jî qurbaniyek e ji qurbaniyên şerê qirêj, û kete nav rêzên pakrewanên rojnamegeriya Sûriyê.

Li ser rola ragihandin û çapemeniyê jî wiha hat gotin: ((Di van rewşên dijwar de, ragihandin û çapemenî bûye kêreke dûdevî, tiştê baş û giring jê tê, ziyan û xirapiyên mezin jî jê peyda dibin... Rola wê di rewşên şerê niha de ne kêmtirî rola hêzên çekdar e.

Li ser rewşa çapemeniya kurdî jî wiha hat: ((Roja îro gelek rojname, kovar û belavokên rengereng li navçeyên kurdî belav dibin. Ew cihê spasî û şana xêrê ye. Lê belê li ber roniya rewşên tevahî yên Sûriyê û gelê Kurd, û çawahiya nêzîkbûna çapemeniya kurdî ji mijarên siyasî, pirs û pirsgirêkên doza kurdî re û xemqisawetên xelkê yên rojane, pirsine rewa û giring li ser zimanê xelkê digerin, … Gelo! Li roja îro û di van rewşên nazik û dîrokî de, ragihandin û çapemeniya me ya kurdî li Sûryê li gor demê ye?... Bi erkên xwe radibe?... Partî, sazî, rewşenbîr û xudî sermyanên Kurd ji bo avakirina ragihandineke çalak û bi hêz çi dikin û kanin çi bikin?... Em dikarin bêjin ku, hîn pir tevdîr û amadekarî bi me pêwîst in, ta ku ragihandina Kurdî li Sûriyê bigehe pileyke baş û bilind. Li ser rola neyînî ya ragihandina kurdî jî wiha hat gotin: ((… beloqkirin û tevdana nerindî û nakokiyên partîtî û çêkirina nûçeyên bervajayî û derewîn, ciyê nerazîbûna xelkê me yê Kurd e, û di van rewşên nazik û dîrokî de ziyanê peyda dike…)).

Gotina weşanên serbixwe jî, ji hêla mamoste Mihemed Bilo ve hat xwendin, tê de giringiya rola çapemeniyê û ragihandinê xuya kir. Gotina rojnamevanên serbixwe jî ji hêla D.Ebdelmecîd Şêxo de hatin gotin, di gotina xwe de bal kişand ser Rojnama Kurdistan û xudiyê wê gorbihuştî Miqdad Midhet Bedirxan, ser hejmarên wê û rola rêzdar Kemal Fuad di nasandina li sala 1967an, wî diyar kir, ku 31 hejmarên rojnamê ji bilî hejmara 19an li Almaniya hatin dîtin û li wir parastî ne. Li dawiyê jî gotina Partiya Yekîtî ji hêla sekretêrê partiyê mamoste Mihidîn Şêx Alî de hat kirin. Di gotina xwe de, berêz Şêx Alî pîrozbahî bi vê rojê kir û li ser rewşa sûrî axivî û tekez kir ku ji ber siyaseta tekpartîtî ku rêjîmê dajot, ew di ber rewşa miletê sûriyê de berpirsyar e. Rêz. Şêx Alî rola îslama siyasî jî anî zimên û çawa ku her duyan hev temam kirin û serhildana gelê Sûriyê jî ji riya wê derxistin û bi alîk berevajî de dan.

Şêx Alî li ser girîngiya yekbûna gelê Kurd tekez kir û wek rêka rizgarbûna gelê kurd dît. Wî nimûna Kobanê anî û serkeftina wê bi berxwedana YPG û piştgirtîya Pêşmerga û hêzên navdewletî nîşan da. Şêx Alî anî zimên ku Rêvebiriya Xweser ku li deverên kurdî hatiye raghandin girîng e ku were parastin û dewlemendkirin , û xuya kir ku pir kes çavên wan dêşin dema dibînin, ku Kurd xwe bi xwe bi rê ve dibin.

Di ahengê de, moralên beşdaran bilind bûn. Gelek sitran jî ji hêla çend hunermendên Efrînê de hatin pêşkêşkirin. Komên folklorî Jî (Zîlan , Çençelya , zarokên Kefer Sefrê ) hunera xwe ya xweşik pêşkêş kirin.

**Cezîrê**… Li navça Cezîrê jî, çend aheng sebaret cejna rojnamegeriya kurdî li dar ketin. Gotina partî û nivîskaran tê de hatin xwendin, ji nava wan, Newaf Ebdella endamê desteya sernivîser ya Rojnama Newroz gotina rojnamegeriya partiyê tê de xwend, û bal kişand ser rewşên ku sûriyê, gelê kurd û rojnamegerî û medya kurdî tê de ne, û pêdviyên rewş û demê.*

## Xelata….. Dûmahîk

Rojnama Kurdistan re, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd bone li serê Çiyayê Qaziqli li devera Cindirêsê bi şahî û rêwresman vejand. Bi wê boneyê û bi derketina hejmarên nû ji Rojnama Newroz piştî ku dora du salan rawestî. û derbasbûna du salan di ser pakrewanbûna sernivîserê Newrozê hevalê me Kemal Henan re, xelatek bi navê ((Xelata Kemal Henan a Pesendkirina Nivîsandina bi zimanê Kurdî di çapemeniyê de)) hat ragihandin. Komîta xelatê, gotina damezrandina xwe di ahengê de xwend, ev e deqa wê:

### Daxûyaniya Damezrandina Xelata Nemir Kemal Henan

Bi boneya cejna rojnamegeriya kurdî,me çend heval û dostên rêzdar Kemal Henan civînek lidarxist;di encama civînê de, ji ber rola Kemal Henan di pêşvebirina çapemenî û zimanê Kurdî ..

6

**Xelata….. Dûmahîk**

di Rojavayê Kurdistanê de, me Xelateke salane bi navê (Xelata Kemal Henan)damezrand.

Komîta (Xelata Kemal Henan)ji bo pesindkirina nivîsandina zimanê Kurdî di weşanên Kurdî de biryar daye ku hersal di cejna rojnamegeriya Kurdî de vê (Xelatê û li gel tibabeke diravî) pêşkêşî pênûseke Kurdî bike.

Herweha pêwîst e,em di vir de pir bi kurtî jînegeriya nemir Kemal Henan bidin nasîn. Kemal Henan di sala 1954an de li navça Efrînê ji dayik bûye. Ewî li Efrînê xwendiye û bawername ji peymangeha rêkên tirênê li Helebê wergirtiye.Di 16 saliyê de ta dawiya jiyana xwe di tevgera azadîxwaza Kurdî de xebitiye û pir salan di partiya Yekitiî de endamê komîta navendî bû. Ew yekek ji damezrênerê (Nadî Efrîn El-ehlî 1969) bû. Kemal Henan 15 salan sernûserê rojnama Newrozê bû û yekek ji damezrênerê (Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî) bû li Rojavayê Kurdistanê. Wî pir caran astengî ji aliyên hêzên parastina dewleta partiya Be`s de dîtibûn. **Kemal Henan** di 31.10.2013an de li Helebê şehîd bû.

**Komîta Xelata Kemal Henan**

Fatme Mihemed

Dr.Ebdilmecîd Şêxo..

Dr.Mihemed.E.Elî

**Efrîn 24.04.2015…**

Komîtê di şêwrên xwe de baş dîti bû ku xelata yekemîn bide nivîskara Kurdî, endama desteya sernivîser a belavoka ((Rewşen)) xanim ``Ze`fet Henan``. Belavoka ``Rewşen`` ji hêla Komela Rewşen Berdirxan a Jina Kurd li Efrînê bi du zimanan derdikeve, erebî û kurdî. Pîroz be li xanim Ze`fet xelata Kemala Henan, û hêviyên pêşdeçûn û serkeftinê jê re dikin.



**Em dikarin ….. Dûmahîk**

armanca cêkirina wêneyan li ser dîwarê lîstokgeha werzîşî pêk hat, ev çalakî ji amadekirina Yekîneya Pişgirtîya Mirovantî a Komîtên Buhara Kurdî, komela El Melak y Xêrxaz û Tevgera Ciwanên Kurd û bi piştgirtîya ( Şebekêt Eman ) bû. Di vê çalakîyê de bêtir ji 70 zarokî beşdar bûn , wan bi wêneyên xwe yên ciwan dîwarên bajarê xwe xwaşik kirin. Tê zanîn ku ev çalakî hat kirin da ku bandorên neyênî yên şerê sûriyê li ser wan zarokan hinekî kêm bibe.

## Belvkirina fêrnameyên zimanê kurdî

Di 11-4-2015an û li gundê Kêla-Herêma Efrînê, Sazîya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li Sûriyê fêrname li hejmarekê ji şagirtên xwe belav kirin. Çar ji asta yekemîn, 22 ji asta duyemîn bûn. Di wê ahengê de çend gotin hatin kirin û li ser girîngiya fêrbûna zimanê zikmakî tekez bû, bi taybet jî di jiyana gelên bindest de wek gelê Kurd. Pişt re, mamoste jî hatin pîroz kirin.

## Ahengek li Gemrûkê



Li 17-4-2015an û bi dilşadiya hatina buharê, rêxistina xwendekaran a Partiya Yekîtî ahengek li darxist. Aheng li aliyê gundê Gemrûkê li ber çemê Efrînê bû, û bi sedan ji endamên partiyê û piştgirên wê lê beşdar bûn. Şahî bi hazirbûna komên Nîştîman, Hawar û hin hunermendên Kurd dewlemend bû. E.Q



# Profêsorê Navdar Haciyê Cindî

▪ M.T.Hemo

Haciyê cindî kesayetiyeke navdar ji kurdên Soviyêta berê ye. Ew nivîskar, ekadîmî, rojnamevan, wergêr û lêkolînerekî naskirî ye di zargotina kurdî de .

Heciyê Cindî di sala 1908an de li gundê (Amançayîra Qersê) ji dayîk bûye. Tev Ermen û Kurdên Êzdî di sala 1918an de ji ber Roma reş koçe Yekîtiya Sovyêtistanê kir. Wî xwedanên xwe wenda kirin û di sêwîxaneyan de mezin bû.

H.Cindî xwendina xwe di warê pedegociya (zanîna perwerdeyê) di sals 1929an de bi dawî kir. Ew Kurdê yekem bû ku di zanîngeha Yêrîvanê de beşê (fîlolociya) xwend.

Wî di sala 1930î de gelek tişt pêk anîn, wek:

1- Komela nivîskarên Kurd li Yêrîvanê damezrand.

2- Wî û jina xwe (Zeyneba Îbo) di beşê Kurdî di radiyoyê Yêrîvanê de kar dikirin, û bi dengê wê yekemîn car weşana radiyoyê bi vê gotinê dest pê kir: (Yêrîvan xeber dide, guhdarên ezîz bibihîsin xeberdana me bi zimanê Kurmancî).


3- Di rojnameya (Riya Teze) de ku li 25-3-1930î dest bi weşanê kiri bû ber pirsiyarê beşê wêje û çandê bû.

Ew li sala 1939an ji aliyê asayişa Sovyetî (K.G.B.) ve li ser hat girtin û salekê di zindanê de ma, tewana wî ew bû, ku li dij şoreşê kar dike û têkilya wî bi derveyî welêt re bi mîr Cladet Bedir Xan re heye!. Û piştî ji zindanê derket demekê bê kar ma.

Lê piştî wê, û li ser daxwaza Mosko di 25-6-1944an de Elfabêya Kurdî ya Kirîlîkî amade kir, pê gelek pirtûk hatin çapkirin û di dibistananên fermî yên Kurdî de hatin fêr kirin.

Di sala 1962an de bawernameya doktora di folklorê de stand û di sala 1966an wek pirofêsor hat binavkirin.

Pirofêsorê payebilind Heciyê Cindî li 1-5-1990î çû ser dilovaniya Xwedê û li şûna xwe gelek berhemên hêja hîştin wek:



*Heciyê Cindî*
*1908-1990*

1- Hikayatêd Cimeta Kurdan.

2- Kilama Cimeta Kurdan.

3- Folkilora Kurmanca .

4- Ker û Kulikê Silêmanê Slîvî.

5- Du Lîstikên Şanoyê.

6- Romana Hawarê.

Û gelek gotar û pirtûkên wî yên din jî ji bilî wan hene.

Pakrewanê Kurd H. Cindî bi roleke mezin di amedekirina nifşekî gelek hêja de ji rewşenbîrên Kurd ên Sovyetistanê de rabû, wek Qanatê Kurdo, Ereb Şemo, Eliyê Evdirehmên û H.W.D.

---

**Cejna Sersala …. Dûmahîk**

giyanê miriyan tê kirin.

Îsal Êzdiyên Çiyayê Kurmênc (Herêma Efrînê), wek reşgirêdanekê bi Êzdiyên Şengalê re, û ji bo şermezarkirina karên terorîstî ku li dijî kurdên Êzdî bûn, wan şahiyên cejna Sersalê ne kirin, ew tenê li malên xwe man, rêwresmên wê li dar xistin û cejn li hev pîroz kirin. Li ber Komela Êzdiyan li Efrînê jî, rêwresmên biçûk hatin gerandin û sersal hat pîroz kirin. Hevalin ji komîta rojnama Newrozê jî çûn seredana Komeleyê û ew bi wê boneyê pîroz kirin… Emê dîsa bêjin her sal cejna sersala kurdên êzdî pîroz be.*

# Xwedana derî

■ **Bahoz Duderî**

Ji kengî de
Di sersalê de
Sersal zû tê, dereng tê
Derî hîn girtî ye
Nizanim
Rêwî ye
Mirî ye
Nizanim zindî ye
Wek min ew kî ye
Pêjnek tê û dere
Wek dînekî dipirse
Ji toza xwe
Ji tirsa xwe
Ji êşa xwe
Ji kengî de
Di sersalê de
Derng tê, zû tê
Belkî ew xudî
Ez im
Yê mirî û rêwî
Ez im
Bibore.. bibore
Ji min e tu li vir î
Tu li wir î
Bêtirî girî nema
Nema dayê
Ji bîr dikim tu
Li wir î
Li wir î

***……… Heleb-Şêx Meqsûd.. 2015***

# Hate cengê

■ **Nûşîn Bêcirmanî**

Vê dilberê dil herifand
Yek rim ji çava lê kişand
yekser bi ar wê laş kewand
çibkim ji van çavên xedar

Çav hatine cengê bi dav û tîr
ê ku xwe girt ew bûye mîr
naçim tu carî ji hiş û bîr
mîr im ji dêman re siwar

Dilber şevek da min û çû
çilo revand dil biriye kû
tenê dizanim roj e rû
dil vegerê dilber hewar!!

Nadim tu car dil yê min e
zulfan ji nû kir çin çin e
rim werkirin ev yar kin e
ew hate cengê bê hedar

Yek maç ji lêvê qet neda
çi bikim di cengê hey xweda
wê dil dixwest min can jî da
ji nû dida min bax û dar

Lêva te meyxana min e
derya te yarê bê bin e
hahoo.. delalê ev çin e
ji reh birîm, ew bûye war

Dengê te xef hat roj hilat
ronya te dabû nav welat
şewqê dida birc û xelat
ji wî devî mey hate xwar

# Zarok û Jîngeh

Vejîna Kurd

Zanyarê derûnzanînê yê Emerîkî Watson dibêje: "Çend zarokên xwedî tendurustiya baş bidin min, ezê di paşerojê de wan bikim bijîşk, hunermend, bazirgan, diz an parsek jî...." . Ev gotin tê wateya ku di hemû qonaxên jiyanê de, jîngeha civakî bandoreke mezin li kesayetiya mirov dike, lê di vî warî de taybetmendiyeke zaroktiyê heye.. ji ber ku zarok zeviyeke xam e, sinc, rewişt, raman û adetan ji derdora xwe werdigire.

Zanyarên derûnzanînê teqez ku kesayetiya mirov berdewamiya şarezayên ku di zaroktiyê de birine ye, û tovên kesayetiyê di wê qonaxê de tên çandin. Gava pêşîn ji nîgarkirina kesayetiya zarok di malbatê de dest pê dibe, ew hertim dê û bav nimûneke mezin ji xwe re dibîne, û nakokiyên wan bi şêwakî neyînî bandorê li wî dike. Ji aliyekî din ve, sinc û rewiştên malbatê û rewşa zarok di malbatê de kesayetiya zarok didarêjin û di paşerojê de ew baş diyar dibin. Piştî malbatê, civak zarok hembêz dike, bîr, bawerî û adetên xwe di hişê wî de diçîne.

Derfeta hînkirinê, girtina şarezayan, avakirina şiyan, nayab ابداع û behreyan û pêşxistina raman, ziman û zanînê ustubariyên civakê ne, herweha civak dibe sedema pêşxistina wan hêmanan û derxistina wan bi şêwakî baş û durust. Di vî warî de jî, bêguman rola kesên derdora zarok, çîrok, çîrokên gelêrî, pend, şîret, pêkenok, alavên pêwendiyê, întêrnêt, telefizyon........ û HWD zor girîng e.

Em ji bîr nekin ku dibistan jî roleke mezin di nîgarkirina kesayetiya zarok de dilîze, ji ber ku dibistan ne tenê hînkirin e, lê ew perwerdekirin e jî.... Mamoste, şagirt, sazûmana dibistanî û rêbaza fêrkirinê dibin sedema pêşketina zarok. Hêjayî gotinê ye ku di perwerdekirina zarokan de, lihevhatin û nedijayetiya di navbera jiyana malbatê, jiyana dibistanê û ya civakê de cihekî bilind digre.

Ji bilî kirdeyê ku me li jor anîne zimên, jîngeha siruştî jî rolekê di avakirina kesayetiya zarok de dilîze, ax, ba, baran, derya, tarîtî, dengê ajalan.... û H.W.D, bandoreke mezin li derûna zarok dikin, pir caran metirsiyê dixin dilê wî û di paşerojê de ew dibe mirovekî tirsonek û nexwedî biryar...

Ji ber wê yekê jî, gelek zanyaran hewla destêwerdana jîngehê kirin, armanca wan ew e ku jîngeh di vê mijarê de roleke erênî bistîne ta ku nifşekî jîr, zana û pêşketî diyarî civaka mirovahiyê bibe.

# Diyarîkirin

Tevgera vejandina nivîsa bi zimanê Kurdî- zarê Kurmancî- û bi tîpên Latînî, ji Mîr Celadet Bedirxan û Kovara Hawarê de dest pê kir û bi kovara ``Ronahî`` jî zelaltir û berdewam bû. Pişt re Mîr Celadet, li gel zanyarê Firensî Rojê Lîsko pirtûka (Rêzimana Zimanê Kurdî - zarê Kurmancî) jî danî. Tê de, her du zanyaran bingeh û stûnên zanistî yên sereke ji rêzman, kesandin û vekîta(rênvîs) zarê Kurmancî re danîn.

Di baweriya me de, sê kirde (xal) hene, dikin ku lêkolînên Celadet bibin bingeheke rast û durust ji rêzmana kurdî – zarê Kurmancî- re. Yek: Celadet bi heft zimanan zanî, çar jê Ewrupî bûn. Didu: Ji xelkê Cizîra Bota bû, ango ji navenda Kurdistanê û ji cihê axaftina zelal û resen bû. Sisê: Di riya kovarên Hawar û Ronahiyê re rêzman û şêweya rênivîsa xwe xiste warê bikaranînê û tê de jî bi ser ket. ......

10

**Diyarîkirin …. Dûmahîk**

Piştî ku Mîr Celadet çû ser qedera xwe, hin nêrîn û pêşniyarên nû ji hêla hin bendewarên zimên de derketin, mîna Osman Sebrî, Kamîran Bedirxan, Reşîtê Kurd, Qanadê Kurdo û hin din jî, hinekan xwastin, tîpina zêde bikin, nîşandekan dînin ser hin tîpan û nêrînine din jî pêk wînin. Loma jî carina, hinek cudahî di hin xal û warên rêzmanî û vekîtê de derketin meydanê. Lê piraniya wan nêrînan cihê xwe ne girtin, û piraniya pir ji nivîsakarên Kurmancî li ser şopa Mîr Celadet mane û pê bendewer in.

Desteya serninver jî, li dema ku dest bi weşandina rojnama xwe ``Newroz`` kir, biryara xwe dabû, ku li ser şopa rêzman û rênvîsa Mîr Celadet bimeşe û rêzikên ku wî di warê rênivîsê de danîne bikar wîne, eger nêrînine din û cuda di hin babetên zimanî de jî hebin, nemaze di warê ``gihandin û jihevdûrxistina bêjeyan`` de, ewê li ser riya Celadet û Hawarê here, ta berdêleke[بديل] zanistî ji hêla koreke[مجمع] zimanî de şûnê digire.*

## Li Efrîna Xwe Xwedî Derkevin!!



Di şaristaniya nûjen de rêk, ava vexwarinê ya pak, elektrîk, derkirina durust a ava şor û tiştên sereke ji bilî wan, ji avahiyên bingehîn in. Hebûn û peydakirina wan, şana pêşdeçûna dewlet û civakan e û asta geşepêdana wan pê têne nasîn jî.

Roja îro, rewşa hikumeta navendî li Şamê ji hemî aliyan ve di deraqekî pir xirab de ye. Rewşa parêzgeha Helebê bi hemî navçeyên xwe ve, ew jî li ber çava ye.

Rewşa navça Efrînê bi xwe jî ji ya navçeyên derdora wê ne çêtir e. Erê di hêla ewlehiyê de, û li gora baredoxa[rewş] cîranên me, rewşa navça me baştir e, lê ji hêla karê xizmetguzariyê û bidestxistina pêdviyên bingehîn de, ew jî pêrgî aloziyên giran dibin. Nimûne jî di vî warî de gelek in.

Wek nimûne, piranî, eger em nebêjin hemî, rêk û kolanên Efrînê û bajarokên deveran gihîştine rewşeke pir xirab, û eger ew netên durustkirin, ew di demeke nêzîk de nema bikar tên. Loma jî, tê xwastin, ku rêvbiriya navçê, partî, welatî, dewlemend û xelkê me yê li derveyî welêt jî destên xwe bidin hev, û ji peydakirina pêdviyên bingehîn re li çareyan bigerin. Ji ber ku, di van demên teng de, pêkanîna pêdviyên bingehîn, ne tenê ustubariya rêvebiriya herêmê ye, ew ustubariya hemî xelkê civakê ye. Pir tê xwastin û gerek e jî, em hemî destên xwe bidin hev û di ber barê xwe yê civakî, xizmetgûzarî, netewî û H.W.D de jî rabin.

Gava em dibêjin (em) em çêre welatiyên xwe yên ku ji Efrînê derketine jî dikin. Em ji wan re jî dibêjin, eger win niha bi destê Efrîna xwe ya rengîn negirin û di ber barê niştecihên wê û xelkê xwe de ranebin, winê kengê dênê wê yê giran bidin!? Win kanin komeleyên xwe ava bikin, alîkariyên xwe di riya wan re bişînin û li ser xerckirina wan alîkariyan, diravî û bilî wan jî, çavdêr bin. Efrîn ne ya karmendên rêvebiriya demkî, partyekî yan jî kesine din e, ew ya hemî xelkê wê ye; pêwîst e em hemî ji bo xizmeta wê û welatiyên xwe bixebitin, bi bihaneyan negirin û ranewestin. Ji ber ku, di qeyranên wiha de, welatne tenê bi hêz û fedakariya mirov tê parastin, ew bi vîna welatiyên bi qîret, bi rêvebiriyeke çalak, bi keda hemî pêkhatiyên siyasî û civakî pêk tê. Wê hîngê ewê kani be ne li ber hemî dijawriyan pêdartir û berxwedêrtir bibe.*


Tendurstî

# Tirsa Nexwaşiya Kûçikanî!

Ji berê de tirsek li ba xelkê ji gezkirina kûçikan heye. Ew di hişê wan de bi nexwaşiyeke xedar ve girêdayî ye. Ew jî tiştekî rast e. Li demên berê, berî ku aşle û derman ji nexwaşiya kûçikanî re peyda bibe, kesê ku kûçikan gez dikir û bi nexwaşiya kûçikanî diket bi mirinê re rûbirû dibû.

Sedema ``Nexwaşiya Kûçikanî``-em kanin ``Seganî`` jî jê re bêjin- Vêrûsek e li ba kûçik, çeqel û lawirên mîna wan tê dîtin, lê belê vêrûsa Nexawşiya Kûçikanî li ba her segekî ne tê dîtin û bi xwe re hilnagire. Loma jî ne her kûçikek î vegirdar e. Tenê kûçikê nexwaş vegirdar dibe û kane kes yan lawirekî gez bike û nexwaş bike.

Kûçikê nexwaş bi xwe jî di derdora heft ta deh rojan de bi nexwaşiyê dimire. Lê berî ku bimire, ev berjeng li ser dertên: Ew natebite, çav sor dibe, gilêz ji dêv diherike, bêhiş û amanc dilive û kane bê sedem hêriş bike û gez bike.




Tirsa mezin ji kûçikên aware tê. Ew kûçikê xudînenas û nexwaş, kane bi kûçikên şivanan û yên malan bigirin û wan nexwaş û vegirdar bikin.

**Eger kûçikekî bi kesekî girt emê çi bikin?**

-Li destpêkê emê cihê birînê tazî bikin û dora panzde xulekan birînê bi avê û sabûnê bişon, birînê vekirî bihêlin û paşê herin ba bjîşkekî. Tiştê ku gerek be wê li ba bijîşk were kirin.

-Eger kûçik ê malê be yan xwedînas be, gerek e netê kuştin û li rewşa wî ya tendurustî û berjeng û dîmenê ku lê peyda dibin were nêrîn. Eger tiştekî ne asayî lê hat dîtin, tê wê wateyê ku ew nexwaş e, û derfet bilind dibe ku kesê gezkirî jî nexwaş bibe. Di wê navberê de, kesê gezkirî wê çû be ba bijîşkekî û aşla yekê ya li dijî nexwaşiya kûçikan biri be. Eger di wan deh rojan de seg nemir, geza wî wek birîneke asayî tê dermankirin, tirs ji nexwaşiya ``seganeyê`` jî namîne û seg nayê kuştin.

**Lê ya giringtir xwevegirtin e:**

Gerek e mirov, bi taybetî jî zarok werin fêrkirin çawa bi kûçikan re bidin û bistînin, û kengî û çawa vê re bilîzin yan nelîzin.

Gerek e haya mera pir ji kûçikên çolê, aware û yên şivanan hebe, xwe nede ser wan. Ji ber ku ew jêdera nexwaşiya kûçikanî ne. ji berê de gotine: ((Xwevegiritin ji derman çêtir e)).

Pêwîst e, ku şaredarî li gel saziyên tendurustî û bijîşkên Bêterî li ser rewşa deverên xwe çavdêr bin û xelkê me ji metirsiya kûçikên aware biparêzin.*

# Lehî

■ Celadet Bedirxan

Tifaq û yekbûn, zexmî û xurtiya civatê ye. Nifaq û berberî qelsî û jarîya wê ye.

Di vê cihanê de her tişt her mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayîna hev ber barên hev, bi hevgihana mirov û bi hevgihandina xebatên wan hatine pê.

Milet û dewlet bi tifaqê gihane bilindiya her tişt û bi nîfaqê ketine biniya kortala neyînê. Ji lewre mirov dikare bêje, heyîn di tîfaqê de, neyîn di nîfaqê de ye. Xurt û zexmiya yekbûnê di lehîyê de gelek qenc têt dîtin.

Ma lehî çî ye ?

Lehî ji hevgihana dilopên baranê pêve ne tu tişt e. Peşkên baranê gava ji hev cuda û yek bi yek dikevin rûyê erdî, erd wan dadiqurtîne, tîbûna xwe pê vedikujîne. Lê gava digehên hev, hingî ji wan peşkên qels lehîke mezin radibe. Dilop û peşkên baranê bi yekbûnê di tifaqê de ne. Erdê dilopxwar hêdî di destên wan de lehîstokek e. Ew serdestên erdî ne. Bi erdê re dileyizin; sînga wî qul dikin, bilindiyên wî hildiweşînin, kendalên wî diqelişînin.

Lehî wek hûtekî har û hêç radibe ser xwe, ji pal û kaş û newalan dadikeve. Li ber wê tu kes, tu tişt; bican, bêcan nema dikare bisekine. Lat, zinar, kevir, rêl, dar, direh serên xwe li ber xurtiya tifaqa dilopan ditewînin û lehî, ew şahinşehê yekbûnê ewan mîna çilowên sivik dide pêşîya xwe, rêş dike, dimale.



Halê kurdan jî ev e. Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tên daqurtandin. Ko gihane hev dibin lehî, lehîke mezin, tu kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata welatê me di rabûna vê lehiyê de ye.

**Bêrût: 28 Tebax – 1929**

# Cejna Sersala Êzdiyan

Cejna Sersala Êzdiyan dikeve roja Çarşema yekê ji meha Avrêlê bi demjimêra Rojhilatî. Di wê rojê de hemî bawermend û pêgirên ola Êzdî ``Cejna Sersalê`` li hev pîroz dikin û rêwresmên wê li dar dixin.

Cejna Sersala boneyeke pir kevin e, ji dîroka gelên Mîzopotamiya de maye, mîna gelê Somerî, Horî, Aşûrî, Ekadî, Medî, Babilî û H.W.D. Yanê ew bi dem, rêwresim û wateyên xwe ve, ji kûraniya dîrokê de maye, û hîn jî tê bibîranîn û lidarxistin.

Bingeha wê ya ramanî ew e, ku afrandina cihanê di wê rojê de temam bûye. Di Qewla Êzdî ``Afirîna Cîhanê`` de hatiye:

Xwedawendê min li Înê kir esas e…

Li Şemiyê lêkir kiras e…

Li **Çarşemê** kir xilas e …

Loma jî Çarşem mîna destpêka jiyaneke nû tê birin, û saleke nû ji çar werzan dest pê dibe, destpêka wê jî Buhar e. Di Buharê de kalbûn[îxsab] çêdibe, û jiyaneke nû tê afirandin û vedibe, û gerîneke[dewra] jiyanê ya nû û saleke nû jî dest pê dike. Loma jî şana cejna Sersalê ``hêk``e, ew bi gelek rengan tê xemlandin û li ser sivrê tê danîn. Hêk jî şana bûndinê ye, reng jî destnîşana hemî rengên gul, geya û pêkhateyên jiyanê ye.

Li demên berê, şahiyên cejnê li ber mezel û pîrozgehên gundan radibûn. Şêniyê her gundekî li wê rojê diçûn ber gorên miriyên xwe, li ber pîrozgeha gund qurban dikirin û şahiya xwe li dar dixist. Çinkî li ba mirovên berê û di ola Êzdî de jî, mirin ne bi wateya ``nemanê`` ye, dema ku mirov dimire, ew tenê qalib û kirasê xwe (govdê xwe) diguhêre, lê giyanê wî zindî dimîne û li warê xwe dijî. Ew xwarin û şabûn jî ji bo ……..❼

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**